Mewlana/Melayê Cizîrî û Dîwana wî ya hunerşah Beş -4-

Ji nivîsîna: Emîn Narozî

Rewşa ziman û vejîna wî di Dîwana Cizîrî de

Gava mirov baş honraweyên Cizîrî dixwîne û ji her hêlê ve lê dinihêre dibîne ku Melê di honraweyên xwe de çiqas li evîn, tesewif, felsefe, dîn, rewanbêjî, rêşînasî, astronomî, mûzîk û ahengên muzîkê fikiriye ewqas jî bala xwe daye ser rewaniya ziman û xweşbêjiya wî çawa ku li jor jî nîşanên wan derbas bûn. Wî di gel bikaranîna gelek gotin û hevokên biyanî jî ku bi rastî ew jî zahf bi şarezayî xebitandine, zimanê kurdî çi ji hêla rêzimanî ve û çi jî ji hêla struktur û avakirinê ve be û çi jî bi awayê pevgirêdan û vejandina qotin û derbirînê ve be bi her awayî bi hostatiyeke pir bi rêkûpêk bi kar aniye.
Ji ber vê jî mirov texmîn dike ku xwestiye nîşanî dost û dijminan tev bide ku zimanê kurdî bi zarava û devokên xwe yên dewlemend ve xwedî hêzeke ku kare hemberiyê bi hemî zimanên navçeyê, heya bi yên cihanê re jî bike.

Ji bo vê jî wî hem gotinên zaravayên kurdî di şi´rên xwe de bi kar anîne û hem jî ji gelek devokên/varyantên kurmancî pir nimûne dane ku ji van jî dixwiyê ew bi ziman, ferhenga kurdî û hevoksazî û peyvnasiya wî jî baş serwext bûye û li pirrên deverên kurdistanê geriyaye û li ser zimanî xebat jî kiriye.

Çawa ku Abd ur-Rehîm Rehmiyê Hekarî jî bi honraweyekê ev serwextiya wî ya bi zimên destnîşan kiriye û pê pesnê Melayê Cizîrî daye:

Şîrazî li nav fursan kêşa ´elema ‛işqê
Mella te bire ew can Hafiz bike pê meşqê

Lakin bi kirasek dî nûrê şefeqek tê da
Dîbayekî kurmancî raçand di Cizîrê da

Mella te wekî Hafiz Firdewsî nekir ustad
Hem ‛işqê ji nû hilkir Kurmancî te kir îcad

Pûlêd zexel Kurdî te bi yek nezerek zêr kir
Mala ku feqîr mayî tijî durr û gewher kir

Kurmancî divê herdem fexrê bi te kin el-heq
Lakin tu ku Mensûr î rutba te bû ena l-Heq
Abd ur-Rehîm Rehmiyê Hekarî[20]

Bikaranîna zaravayên kurdî û devokên/vayantên kurmancî di Dîwanê de:
Bikaranîna zaravayan:

Zaravayê soranî:
- Ji dêla Xwedê: **xwey**/**xwoy**/**xwa** gotiye:

Ku tûlê asîtanî dûr nekî êdî ji dergahî
*Ji ba **Xwey** vê ricû nakin di babê lutf û rehmê da*

Em hêvî dikin ku tu tûleyê ber derîzana xwe ji dergahê xwe dûr nekî.
Haşa ev ne ku daxwaziya me ye ji Xwedê, lê ji xwe ew di beşa qencî û mihrîvaniya wî de heye.

Mihnet û cewra hebîbî qehr û azara reqîbî
*Heq tinê da min xerîbî lê şukur **baxwoy** we daye*

Xwedayê payeberz ji ezelî ve êş û bela û zilm û zora dildariyê û hêrs û keder û tadeyiya hemberiyê jî ji nav cihanê hemî bi tenê para min rebenê bêkes yê dûredest xistiye. Lê di gel vê jî ez li zora xwe naynim, bêhnteng nabim û gilî û gazinan jî nakim, çunkî Xwedê ji ba xwe ew bela daye min û tiştê ew bide şikir jê re.

- Ji bo pir û gelek: **zor**

We´hdetê Mutleq Mela nûr e di qelban cela
***Zorê** di vê mes´elê ehlê dilan şubhe ma*

Ey Mela bêguman *wehdeta mutleq* (yektahiya xweser) rohniyeke ku di dilan de diyar dibe, lê pirên dilpeyrewên rêçika tesewifê di vê pirsa *wehdeta mutleq* de ku digihe heya radeya (wehdet ul-wucûdê) di gumanê de mane. Hinek wê rast dibînin

û diparêzin jî, lê hinek jî tê de guman dikin.
Herweha:

Her şevem ne´rezenan ta bi seher
***Be segê koyê** tu ra hemnefes în*

Ji ber kelewaca evîna te herşev ji êvarê heya serê sibê çavên me nayên ser hev, xew nakeve wan û bi seyê ber deriyê te re em jî heya şeveqê direyin û dizûrin.

- Ji bo giran û şiddetê: **tund** û **tundî**

  Da me şehzade bi destê xwe y mubarek qedehek
  Ne xubarek ji xumarî û ne tundî û ne xeş

Ew dildara ku fena şehzadeyan bi rûmet bû bi destê xwe yê pîroz îstekanek ji şeraba safî, ya bê toz û qirêj, bê serêşiya piştî serxweşiyê, bêtundî û tûjî û bêav û telp û tiştên din da min.

Zaravayê dimilî/zazakî: ji bo Xwedê:**Huma**/**homa**/**humay**

Nefesek bê te me naçî ne dijîn bê te demek
Ji te hat emrê humayûn te we me´mûr-i kirîn (ji bo maneyê li jor binêre)

- Ji bo tirî: **engûr**

Hindekî roj û şev in têk 'îd û Leyl ul-qedri bin
*Cam medam pir bade bit lê ne j' meya **engûrî** bî*

Ez hêvîdar im ku çiqas şev û rojên te hebin hemî cejn û şevên qedran bin û piyaleya te ya şerabê herdem tije badeya xweş ya biçêş be, lê ne ji şeraba tirî, ji şeraba evîna xwedayî be.

Bikaranîna qaydeyên rêzimanî di Dîwanê de:
- **Şev** û **şêv**, **nav** û **nîv**/**nêv**

*Azarê mihrdaran nedî lê destê **bedkaran** nedî*
*Bi nûnekê yaran nedî **nêv**me w xwe **estaran** nedî*
Tîran ji nûbaran nedî derdan bi bîmaran nedî

Ji xeyrî sê caran nedî rîş in nedêrin taqetê

Divê tu guh bidî evîndarên xwe yên rast yên pêbawer, tade û azarê nedî wan û wan nexî nav lepê xerab û bedkarên ku rewşa wan tevlihev bikin û wan bi bihayekî hindik yê nehêjayî nedî, çunkî ew giranbiha ne, herweha ti star û perdeyan nexe nav me û xwe ku bibin asteng ji şabûna bi şepaliya te. Tu tîrên awirên xwe jî ji wan birûyên fena kevanên nû nereşîne me û li me nexe da jana wan jî nede ser ya evîna te, lê ger li gor adetê dilberên giram avêtina wan pêwîst be jî bila ji sê caran ne bêhtir be lewra ji xwe berê dil bi tîrên pêşî birîndar in êdî taqeta wan careke din ji derbên tîrên din re nemaye.

Ergatîf û zimanê axaftinê:
Cinn û teyyarek **midî** werbû di min winda **kirim**
Dame ber pençe w kulaban hilfirandim wek ´uqab

Min dît ku efrîtekî firinde di min wer bû, ez hingaftim û winda kirim, wî ez di nav pençe û napên xwe de girtim û weke balindeyî ez birim ber perê esmanan.

Suflewî **înam** û **avêhtim** zemîna zulmetê
Lê ku hişyar im gelo yan xewn e min **dîtî** bi xwab

Wî firindeyê jêrîn ez anîm û avêtim erdeke reş û tarî, lê ez nizanim gelo ne ez hişiyar bûm gava min ev yek dît yan jî xewn bû.

*Mûyekî ez ji te nadim bi dused **Zîn** û **Şirînan***
*Çi dibit ger tu **hesêb** kî **mi** bi Ferhad û Memê*

Ey dildara min ez yek muyekî bi tenê jî ji laşê te nadim bi dused spehiyên rind yên mîna Zînê û Şêrînê. Hima ji bo vê be jî gelo ma çi dibe ku tu jî min weke Ferhadê evîndarê Şêrînê yan jî Memê dildarê Zînê bibînî û bihesibînî.

Bikaranîna devokên/varyantên kurmancî di Dîwanê de:

- Yê hêla Bedlîsê, Licê û der û dorên wan, “**li bo**” ji dêla “**ji bo**” ve:

Etwarê ´işq û mestî esrarê butperestî
*Teqrîrê sed riwayet nakit **li bo** kifayet*

Bi sedan gotin û gerandina ji devan jî têrî şirove û eşkerekirina rewşa serxweşî û evîndariyê û penhaniyên (sir) senemperestinê nake.

- **Heçî**, **herçî**, **hindî**, **çendî**, **sibe**, **siban**, **sibehan**, **spêde** li gor devokên cihê

- Devoka mardînê “**di dildanî**” ji dêla “**di dildayî**” ve:

Di dil da nî we dîsa dil disojî
“*Etehriq ya melîk el-`husni darek*”

Ey evîndar tu dizanî ku tu di nava dilê min de yî û te ew ji xwe re kiriye cih û war, lê di gel vê jî tu wî bi agirê evîna xwe û dojeha bengîtiya xwe dişewitînî û telef dikî.

- Devokê dora Sêwrekê û der û dorên Amedê peyva **Zatî**.

***Zatî** ji wucûda me sebeb wê tu dizanî*
Naête hisabê felekê tedwîrê

Ey dost ji xwe tu bi rastî sedemê hebûna me ya vê cihanê û afirandina me dizanî û agahdar î ku ew nakeve ber hisab û hejmara çerxa feleka teqdîrkirî û biryardayî. Herweha ew ji bûyin û pêkhatina karên hercarîn yên biryardayî jî nayê fahmê û bi nêrîneke weha di ser re û sivik jî xwiya nabe, lewra ew karekî nediyar e û weke mamikekê ye ku ji bo têgihîştinê pêwîstî bi lêkolîn û lênêrîneke hûr û kûr heye.

- Devokê Torê **rabê** û ya xerzayê jorîn jî **rabî**ye

*Herkesê **rabê**/**rabî** di be´hsê carekê mehder bikit*

Xeyrê heftê hec didêrit belku bihtir ew sewab

Çi kesê ku bi vê babeta dûriya min ji dildarê ve rabe û ji bo rakirina wê dûriyê li cem dildarê şefa´et û doza bexşandinê bike dê xêra heftê hecan, belkî bêhtir jî ji xwe re bîne.

- "**Bi şefqet ke**" devokê mêrdînê, devokê xerza û bişêriyê "**şefqet bike**" ye.

Were pêşber Melayê xwe şehîd û mubtelayê xwe
Bi şefqet ke *liqayê xwe Mela nemrit bi dayê xwe*
Mesîha yî li bîmaran kesên ***geztî*** *du reşmaran*
Şehîdên şîr û mûkaran kirî amancê nûbaran

Li dîdara te heyran im "sebah ul-xeyri ya xanim"
Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê

Ey dildar were pêşberî Melayê evîndarê xwe yê şehîd û tiryakiyê evîna xwe û bi dilovanî wî bi dîdara xwe şad bike da Mela bi van derd û kulên dilê xwe yên cudahî û dûrîyê nemire.
Ey dildar tu jî weke Îsayê Mesîh yê ku çi kesê du bisk yan jî keziyên weke du marên reş ew geztiye yan jî ew kiriye amanca awir û niqînên çav û birûyên weke şûr û miqaran, tev de sax dikî.
Ey dildar û sitiya min a ku ez hesret û arezûmendê dîdara wê me roja te xweş û gula te geş be ey rohnî û bînahîya çavên min ka kerem bike were da ez wê bejna te ya şepal û bala te ya zirav ya hilkişiyayî bibînim û bi dîtina wan bedewî û spehîtiyan şad bibim.

- "ca" ya farqînkî ye, bikaranîna devokê Farqînê û nîşandana "go" ya axaftinê ji dêla "got" ve.

Min ***go*** *di şevan şubhê şemalan we disjoin*
Perwanesifet ***ca*** *here bê sewt û his î tu*

Min ji dildarê re got: Em bi agirê evîna te bi şevan heya serê sibê bi rengê xecxecoka ku xwe diavêje ser mom û çirayê bê deng û pêjn û bêqarîn û zarîn her dişewitin û diperitin. Wê bi dengê bilind û bi xeyd bersiv da û got: A niha rabe ji ber çavên min winda bibe û here da ez te nebînim.

Mela li gor devokan hem "-**ker**" hem jî –**kar**" weke ´**işweker** û **bedkar**, dixebitîne

'Işweker şêwe numa ya me ji wê rûh û heyat
Senema sur ji semed neyşekera leb ji nebat
"Ehsene l-lah û tebarek" ji sura wê senemê

Dildara me ya ku giyan û jiyana me jê û pê ye û her şêweyên cuda yên nazî û delaliyan diyar dike ew senem e ku dilrubayî û pîremendiya hêza Xwedayê bêniyaz e, bejna wê mîna qamîşê şekir çikrast e û lêvên wê jî ji şekirê dilêşê bi xwe ye; pesin ji Yezdan re be bê ew çi dilrubayî û spehîtî ye daye wê senema xwoşewîst û bedew.

*Azarê mihrdaran nedî lê destê **bedkaran** nedî*
*Bi nûnekê yaran nedî nêv me w xwe **estaran** nedî*
Tîran ji nûbaran nedî derdan bi bîmaran nedî
Ji xeyrî sê caran nedî rîş in nedêrin taqetê
(Ji bo maneyê bnr. li jor li xala rêzimanî)

Afirandin û bikaranîna gotinan:

- hem "***sadedil***" û hem jî "**dilsade**" bi kar aniye, dibe ku yek li gor rêzimana farisî û yek jî li gor ya kurdî be, yan jî li gor formên herêmî bin.

*Di riya dostê Mela yekcihet û **sadedil** în*
Me hetta can heye haşa ji teleb dest bihilîn

Ey Mela bêguman em di biwara evîna dostê û hezkirina yarê de yekhêl û yeknêrîn in ku jê pê ve em ji kesî din hez nakin û berê xwe nadinê, herweke ku dilê me jî pê re rast e, tu dilxişûşî û dilxirabî tê de nîne û heya em sax bin jî haşa ku em tu carî dest ji hêviyên jê û ji evîna wê berdin.

'Aşiq divê **dilsade** bit xaka riya yarê xwe bit
Sed dax di dil wek lale bit xwînê bixwit rengxunçe bit

Pêwîst e ku her dildar derbarê evîna xwe de dilpaqij û dilsafî be, xişûşî û bêbextî pê re tunebe û xwe bike axa rêya yarê ya ku pêlê dike û ger bi sedan birînên dax û kewînên mîna yên laleyê

di laşê wî de vebin jî û dilê wî ji derd û xemên evînê xwîn jî bibe û wê xwîna mîna gula sor ya nûbijkojdayî vexwe jî . . .

- ***Pencumîn*/pêncumîn/pêncemîn**

Dê ji çerxê ***pencumîn*** *bêtin tenezzul kit Merîx*
Mîslê Şemsê ger kişînîtin li wan tîxên xezeb

Ger dildar hêrs bibe û şûrê xezeba xwe li stêra Behram û Rojê bikşîne dê Behram ji esmanê pêncan û Roj jî ji yê çaran hahakê bi lez dakevin jêr û serî li ber fermana wê daynin û jê re stuyê xwe xwar bikin.

- Gotinên mîna ***sohtîdil***, ***siyehreng***, ***reşkagul*** û yên din ji dêla ***dilsotî***, ***rengsiyeh***, ***kagulreş*** û yên din bi kar aniye, gelo şibandiye farisî yan jî divê di kurdî de weha bin, yan jî berê weha bûne piştre guherîne?

Ji bo du kirdeyan bi yek predîkatekê (lêkerekê):

Şemsa felekê *ya* ***melekî*** *hê jî nizanim*
Horî û perî *ya bi xwe* ***Rûh ul-qudusî*** *tu*

Ey dildar ez heya niha jî nizanim gelo ev şewq û geşiya rûyê te ji ber ku tu roj bûyî di çerxa esmanan de û daketî xwarê yan jî ew rohniya te ya zêde ji ber ku tu fireşteyeke nûranî yî ku ji rohniyê hatî afirandin, yan jî tu horiyek ji yên bihuştê yî yan jî periyek î ketî kirasê mirovan yan jî tu Ruh el-qudus î pifdikî laşê evîndarên mirî da giyanê wan li wan vegerînî.
Di risteya jêrî de:

"*Ba nesîm dê çî lezînî sax û salim ma tu bînî*
Vî kumêdî lê gehînî da siwar bit lê peya ye"

Ey bayê Nesîm zû here û bilezîne vî hespê kumêd bighîne dildarê da hê ku nesax nebûye û ji rêveçûnê neketiye lê siwar bibe, çunkî ew hem peya ye û hem jî nexweşê bi derdê evînê ye û ji ber xemên dûrî û cudahiyê bêweş e, nikare bi rê ve here.
Du lêker "*dê* ***çî lezînî***" li pey hev bê navgîn û bi yek kirdeyî "***Ba nesîm***" tên bi kara nîn.

Tu pirihsan û xweyrehm î li derwêşan **a** bêxeşm î
Çi bîtin ger bi nîv çeşmî nezer kî tu li astanê

Ey dildara min tu pir camêr, xwedî qencî û dilovan û mihrîvan î û herweha tu ji derwêşên belengaz yên xwespartî re jî bêxeyd, ji wan xweş, ji wan re baş û bi rehm î.
Ma qey çi dibe ku tu hima bi nîv çavî û telikî berê xwe bidî derîzana ber deriyê xwe û vî evîndarê belengaz yê sewsî li ber derîzana xwe bibînî û dilê wî xweş bikî.
Li vê derê mîna devokê Torê ku gelek caran "**a**"yeke weha bi kar tînin, destnîşan dike

Hevoksazî, peyvnasî, peyvsazî û rêzimana kurdî:
*Te divê **zêr û zeber** kî me du zulfan bide ber ba*
Te divê qenc-i qiyamet li me rabit bi xwe rabe

Ger te bivê me serobino û perîşan bikî û me bitewînî hima herdu zilfên xwe bide berbayê bila xwiya bibin bes e û ger te divê bibe roja me ya paşî û qiyamet li me rabe hima tu bi xwe rabe derkeve hafa me hingê em dê bimirin û dê bibe roja me ya paşî.

'Işqa me ji ber mewc û 'ecacê bûye derya
*Wê **zêr û zeber** kit me bi dest hind û xurabê*

Bêguman ji ber kelwahca bengîtiyê û pêlên wê yên mîna bablîsokê evîna me li me bûye weke deryayeke kûr ya bêbinî ku ji ber pêl û mewcên dijwar yên xurt keştîvanê hindî haha ye me serobino bike, bitewîne heya ku niqo bike.

-----
*Ayet ul-Lahî **şerîfnusxe** divên*
*Lê bi **i'rab** û xet û **cezme** divên*
Dilrubayan ne tinê xemze divên
Bi mesîhasifetî 'işwe divên
Samirî sihrisifet şêwe divên

Em yeke ku rûyê wê hemî ji nusxeyeke pîroz ya nîşan û dirûvên destkarî û afirandina Xwedê be û bi xal û nîşanên reş, bi xetên çehre û yên raserî cênîkan û bi daîre û çembera dev û çavan xemilandî be divên. Her weha em ji wan rindên dilruba hinek

taybetmendiyên din yên mîna naz û delaliyên ku weke Îsa (e. s.) dilên mirî sax dikin û layî efsûna samirî maden digerînin golikeke bi morî divên ku hişê dîtiyan şaş û matel dike û radiwestîne.

Yan jî em hevokên weke ayetên Qur`ana pîroz bi rêkûpêk divên lê qayde û rêbazên tewangê yên rast divên, çawa ku em peyv û gotinên mîna yên pêxemberan bi i´caz û beyan û mîna yên hunermend û sihirbazan efsûndar û rewan divên.

Feyza me şubhê Nîl e em Dîcle û Firat in
Ger şeyx û wer îmam e vê ra ye min keşaşkeş

Lehî û rabûna kela dilê me weke ya çemê Nîlê bi feyz û bereket e lê em bi xwe mîna Dîcle û Firat in ku hercar pêl li ser hev tên li dilê me dixin û wî difûrînin ta ku li hev diqalêbin û serobino dikin. Îca ger li vê derê şêx yan jî pêşrew hebin û dijî vê dîtina me derkevin ez amade me di vî warî de bi wan re lecbazî û keşakeşê bikim û derxim holê ku navbera Dicle û Firat jî bi her awayê xwe ne kêmî Misrê û Nîlê wê ye.

Li vê derê Cizîrî hem hersê çemên mezin yên bi xêr û bereket destnîşan dike û hem jî qala du şaristaniyên mezin yên dîrokî ya Mezra Botan/Mezobotamya û ya Misrê dike û pê re jî diyar dike ku kurd û gelên der û dor û yên navbera Dîcle û Firatê jî mîna yên Misrê mîratxwerên miletên kevnare û xwedî bajarvaniyeke kevintirîn û bilindtirîn in.

Cizîrî di honraweyên xwe de gelek sembolên mitolojî û dîrokî di gel kesayetiyên tarîxî û navdar, cih û deverên cografî û welat û bajaran bi awayên cihê û di rewşên cuda de pêşkêş kirine.

Weke nimûne ji Pêxemberan ji Adem û Nûhî bigir heya Yaqûb û Yûsufî, Zerduşt/Zerdeşt, Suleyman û Mûsayî, Îsa û Muhemmed (e. s) û gelekî din, ji eshaban ji Şêrê Eliyî bigir heya Huseynê kurê wî, Hemzayê apê Pêxemberî (e. s.), Xalidê kurê Welîdî û hinekî din (r. e.), ji fîlozofan ji Aristoteles û Empedoklesî bigir heya Eflatûn (Platon) û Sokratesî, ji Îbn Sînayî heya Ibn Ruşd û Xezaliyî, ji mutesewifan ji Hellacê Mensûrî, Marûfê Kerxî û Şiblî bigir heya Îbn Erebî û Suhrewerdî û gelekî din, Ji şah û padişahan ji Cemşîd û Selaheddînî bigir heya Cengizxan û

Tîmûrleng û gelekên din, ji Kesên dîrokî û mitolojîk ji Xizir û Ilyas û Îskenderî bigir haya Gêw û Rostem û Peşeng û Efrasiyabî di gel gelekên din.

Herweha ji serpêhatî û bûyeran jî ji ava heyatê bigir heya teyrê Enqayê, ji evîna Yûsuf û Zuleyxayê, Suleyman û Belqîsê bigir heya ya Ferhad û Şêrînê, Mehmûd û Eyazê, Xwisro û Şêrînê, Mem û Zîn û gelekî din, Ji Cama Cem bigir heya Neynika Îskenderî, ji şûrê Misrî û elmasî bigir heya miska Xetenê ji Silêmanê dunikulî bigir heya zerbavê, ji welatê Belqîsê Sebayê bigir heya textê welatê Xetenê, ji Kabe, Qudis û Beytê bigir heya Laleş û ateşkedeyê, dêr û mizgeft û kenîseyê, ji Ahura Mazda û Hurmiz, Budha (483-563 b. Îsa) û Konficyusî(551-479 b. Îsa)bigir heya Ebyed û Ehremenî (Ezazîl/Îblîs), ji Avesta, Incîl û Tewratê bigir heya Zebûr û sihûfan û kitêbên navdar yên mîna Lubab û Keşşaf û yên din, Ji ziya û mar û dûpişkan bigir heya ejderhayê Dehhak û Kawayî yan jî Ferîdûnş, hemîyan, yan qala wan kiriye yan jî îşaret bi bal wan ve daye.

Ya rasttir bi kurtî mirov dikare bêje ku hima Melayî ji her tiştî salox û xeber daye. Lê herkes li gorî xwe û zanîna xwe yan jî întrese û baldariya xwe dikare yan jî dixwaze hew hinek ji wan fêhm bike û diyar bike.

Çawa ku Abdullah Yaşîn jî dibêje:
"Ustadê Mezin Cizîrî bi zimanekî wecîz û bi risteyên kurt bi awayekî rewanbêjî qala hemî tiştî kiriye û honraweyên xwe bi rewanbêjtirîn û bêhempatirîn hunerê şi´r û edebê honaye.
Bi rastî jî her honraweyeke wî gencîneyeke dagirtiye ji hunera edebî û felsefî ye"[21].Lewra Mela çawa ku ew bi xwe jî di honraweya xwe de dibêje ew mîna derya û okyanos e:

Narê ji rengê dojehê husn û cemala wê mehê
Me d'perdeya vê xergehê xef kir çi 'Umman î Mela

Ey Mela me di bin perdeya dilê xwe yê mîna xergeha serdar û siltanan de agirê evîn û bengîtiyê yê mîna agirê dojehê gurr û wêneyê spehîtî û şepaliya wê dildara rûheyvîn di derûnê dilê xwe de veşartiye. Bêguman ez li vê şaş û heyrî dimînim ka gelo çi dilekî weke deryayekê yan jî okyanosekê bi te re ye ku tu dikarî ewqas tişt ragirî.

Bi l-lah çi teb'et adem î yekser dibêm yek 'alem î
Deryayê Qaf û Qulzum î yan çerxê gerdan î Mela

Ey Mela tu bi xwedê kî tu ji min re bibêjî ka tu çi xuymirov î ku tu dikarî ewqas tade û renca evînê bikêşî? Ez dibêjim qey tu yan bi tena serê xwe cihaneke xweser î yan jî Okyanosa mezin î yan jî deryaya çiyayê Qaf û ya Qulzum î ku tu dikarî ewqas tiştên ecêb yên kesnedî bixî dilê xwe, yan jî tu çerxa felekê ya gereoke û mezin î ku vê cihanê bi hemû kar û kirinên xwe ve digirî nav xwe.

Cizîrî di tesewifê de fenafillahiyê û wehdet el-wicûdê parastiye, lê di dîwanê de hima çi bigir hemî radeyên tesewifê û payeyên wê yên bilind nîşan dane û bi kurtî qala wan kiriye.
Wî her honraweyeke xwe bi herfek ji alfabeya kurdî ya hingê qedandiye ku pê hem awayekî hunerî yê kevnare yê ferhengî destnîşan kiriye û hem jî alafabeya kurdî ya serdema xwe nîşan daye.[22]

Bi rastî jî Mela beşawendên (qafiyeyên) honraweyên xwe ji bilî zal (ذ), ´eyn (ع)û xeynê (غ) bi hemî herfên erebî di gel P, G, Ê û Îya kurdî qedandiye herweha "H:ه"ya erebî jî hem ji bo "H"ya kurdî û erebî û hem jî ji bo "E"ya kurdî bi kar aniye.

[20]Bnr. ´Izeddîn Mustefa Resûl, b. n. r. 49.
[21]Bnr. Abdullah Yaşîn, b. n. r. 118-120
[22]A. Yaşîn, b. n. r 118-120